

SÊ BUYER TEVÎ SÊ HESTAN

DIDERBARÊ XEBATA
KOÇ-KAK'DE AGAHDARÎ

BINGEHA ŞIDETTA NAV MALE YA DÎROKÎ

BEJI, BIJ TIKRIT

MEERTALIG OPVOEDEN

KOMA NIŞTIMAN

TRAININGSWEEKEND KOÇ-KAK-III

RÊZIMAN - KIRDAR

Bestand Beveertan Beeld Favorieten Extra Help

Verzorgd door: Zekken Favorieten Media

Adres: <http://www.nistiman.com/karfonse.htm>

GA noor Koppelingen Norton AntiVirus

NISTIMAN
Ya nistiman ya neman

RÛPELA CIWANAN

Çima rûpelek teze ji bona ciwanan pêwîste? Her civak û her besên civakan bi têkiliyan ava bûne, gesbûne û pêsketîne. Têkiliyên civakek yan ji besên civakek li gor germahiya xwe, naveroka xwe û hawên xwe bejin didin wê civakê. Gava pêwîstî bi têkiliyan nemaye, yan jî têkiliyên hatine qut kirin ew civak yan jî besên civakê helîyane û bi tevayî hunda bûne.

Ji ber wê jî gava meriv bixwaze civakek nas bike, pêwîste ku meriv berê bala xwe bide têkiliyên wê civakê û têkiliyên wê nasbika; wê demê meriv wê civakê jî bi asanî nasdike. Ji ber ku têkiliyên naynîka wê civakê. Di demajoya civakan de tim têkiliyên li pêşîya civakê buye û her wê wehabe jî. Têkiliyên bi tîstîtan re, têkiliyên bi merivan re hestên nû amade dîke, pêwîstiyên nû amade dîke, van

Geerd

Startj Untitled Document

Internet

NAVEROK/INHOUD

Kurdnasîn organa KOÇ-KAK é ye.
u ji sê mehan careke derdikeve.
Kurdnasîn is een uitgave van KOÇ-KAK
Kurdnasîn verschijnt 4x per jaar.

Redaksiyon / Redactie

B. Baran

Leyla

Ferhat

Xebatkar / Medewerkers

X. Uso

Brûsk

Rojin

Zelal

Pergela Rupelan / Grafische Vormgeving

Şefik

Mehmet

Adar

Navnişana Redaksiyonê / Redactie Adres

KOÇ-KAK

Klarendalseweg 468

6822 GW Arnhem

Navnişana Postê / Post Adres

KOÇ-KAK

Postbus 1092

6801 BB Arnhem

E-mail

kockak@nistiman.com

redactie@nistiman.com

AGAHDARÎ	5
SÊ BUYER TEVÎ SÊ HESTAN	6
DIDERBARÊ XEBATA	8
KOÇ-KAK'DE AGAHDARÎ	
BINGEHA ŞIDETTA NAV MALE YA DÎROKÎ	10
DE REDACTIE	13
BEJI, BIJ TIKRIT	14
MEERTALIG OPVOEDEN	18
KOMA NIŞTIMAN	21
TRAININGSWEEKEND KOC-KAK-III	22
RÊZIMAN - KIRDAR	25




Agahdarî

Xwendevanên dilovan,

Ev nêzikê du salan e ku em Kurdnasîn bi hawê kovarek demsalî çap dikin û belav dikin. Me heta niha Kurdnasîn tenê li Hollanda belav dikir. Lê Kurdnasîn bi naveroka xwe ve, bi mişarên pêşiya xwe ve ne tenê bangewazîyê li kesên Hollanda dikir.

Ji ber ku pirsgirêkên me kurdan çî li welatê me be û çî jî li dereveyî welatê me be ji bona me hemî kurdan hevbeş in. Pirsgirêkên civaka kurdên li Hollanda pîrnêzîk wek pirsgirêkên civaka kurd li Almanya, Fransa, Belçîka û hwd. Pirsgirêkên welatê me jî çend bandora xwe li ser kurdên li Hollanda nîşan dide ew çend li ser kurdên deverên din jî nîşan dide.



Bo vê yekê em pêwîst dibînin ku, em dengê xwe bigîjînin kurdên dervayê Hollanda û yên welatê xwe jî. Em pêwîst dibînin dengê xwe tevî dengê her kurdekî bikin. Ji ber ku gava dengên me bikevin ser hev û ji hev re bibin piştgir wê her ku here gurtir derkeve, her ku here wê bilindtir bibe, her ku here wê bibe xwedîyê bandorek hêja li ser gelê me û dervayê gelê me jî.

Li ser van egerên kurt me biryar da ku emê ji niha û şûnde dengê xwe bi rêya internetê belav bikin. Ji xwe rûpelek me heye û ji niha pêve emê Kurdnasîne jî bi rêya vê rûpelê bigîjînin

xwendevanên xwe. Ji bona têkilîya bi weşanên me re hun dikarin li rûpele internerê www.nistiman.com bigerin.

Em hêvîdarin ku emê ji niha û şûnde; bi vê rêya hanê ji bona dengê xwe li hember buyera, li ser kiryanan bilind bikin, nema em hêvîya sê mehan rawestin. Ji ber ku helwest çend di dema xwe de be ew çend bi bandor e, berevacî jî helwest her çend derengtir be ew çend jî bandora xwe hunda dike.

Xwendevanên hêja em pêwîst dibînin ku dîsa bi bîr bînin; her weşanek hêza xwe ji xwendevanên xwe, ji piştgêrî û rexnên xwendevanên xwe digire. Hûn xwendevan jî her dema ku bixwazin û pêwîst bibînin dikarin têkilî bi me re deynin lênêrîn, daxwaz û rexneyên xwe bi dem bigîjînin me.

Em ji niha ve ji bona piştgêrî, rexne û lênêrînen we sipasîyên xwe pêşkêşê we xwendevanan dikin serketin û serfirazîya we dixwazin.

Redaksiyon



SÊ BÛYER TEVÎ SÊ HESTAN

B. Baran

Li Kurdistanê tevgera kurd gav bi gav ber bi serketinê ve dimeşe. Tevî gelek metirsîyên astengên ku derdikevin pêşîya gelê me, tevî ku dewletên mêtinkar bi hemî cûre planan ve û bi xebitandina hemî hêz têkiliyên xweve li dijê destxistinên netewa kurd jî; tevgera kurd ber bi pêşve dimeşe. Roj tune ku dewletên mêtinkar li dijê tevgera kurd, li dijê destketinên Kurdistanê li hev negerin, dek û planên teze daneynin pêşîya wê. Dîsa roj derbas nabe ku dewletên mêtinkar her hawên hêz û kariniyên xwe li dijî tevgera kurd bi dewletên desthilatdar re dayneynin ser masê û nexin ber guftûgoyên li ser rewşa Iraqê û Kurdistanê. Lê tevgera Kurda jî li gor kariniya xwe hemî kertên xwe ji bona serkeftinê bikar tîne.

Di vê demajoya serketinê de li ber hinek metirsîyan gelek gavên mezin hatine havêtin. Lê di nav vana de yanê li Kurdistana Başûr di pêlikên avakirina pêşerojê de sê buyerên girîng pêk hatin ku; van hersê buyerên hanê her çend li ber çavan xwanê neke jî, di nav xwe de mizgîniyek gelek mezin bicîh dikin. Ji bona pêşerojê hêviyek baş datînin ber me. Van hersê buyeran di demek weha de gihîştin hev û bandorek mezin li ser gelê kurd hîştin. Van her sê bûyerên hêja bû egerek mezin da ku li her cîyî hestên hemî kurdan pê geş bibe.

Yek jê kurdek û bi navê kurd, li ser navê kurdan bû wezîrê derveyê Iraqê. Ew bijartina mîrze Hişyar Zibarî ji bona Wezîrê derveyî dewleta Iraqê bûyerek xweser gelek mezine. Tişteki gelek vekirî ye ku hemî têkilî, li hevhatin û girêdanên dewletekê, bi rêya wezaretê derve tînin kirin. Kurdistan werê di cîyek coxrafîk de ye ku hema bêje bi hemî cîranên xwe ra di hundir pirsgerêkan de ye. Kurdistan di bin mêtinkariya Tirk û Ereb û Faris da ye û heta rewşa Kurdistanê weha be wê pirsgerêk û aloziyên me Kurda jî bi wan re hebin. Van dewletên mêtinkar jî wê tim li hember her bidestxistinek netewî ya kurdan, yan jî li hember her hêviyek bi destxistinek netewî ya Kurdî têkevin nav tevgerên dek û dolabên pêşî girtin û tîk birina Kurda. Her çend dubendîti dijberîti û hemberîtiyek wan hebe jî gava pirsê kurd derdikeve rojevê hemî li aliyek tê danîn û ew li dij tevgera kurd dibin dost û birayê hev.

Lê gava wezîrê derve yê Iraqê kurd be û ji aliyê kurdan ve bê destnîşan kirin, wê demê bi hindikayî tu dewletek nikare li dijê tevgera kurd bi Iraqê re tîkeve nav dek û dolaban. Li vir, di vê demajoya girîng de ku rewşa netewî ya kurd û mafê wê tê nîqaş kirin, bazar û gelsên mezin li ser tê kirin zîncîrek ji zîncîra dor Kurdistanê tê şikandin. Ev gavek û bidestxistinek gelek mezine û ez hêvîdarim ku ev rewş di demajoya Iraqa Federal de jî bê domandin.

Buyera diduwan jî ew e ku Serokê Komîteya amadekirina Qanûna bingehîn ya Iraqê jî kurdek bi navê kurd û ji aliyê kurdan ve hat destnîşan kirin. Wek tê zanîn ji bona her dewletê amadekirina Qanûna bingehîn girîng e. Qanûna bingehîn maka hemî qanûnên din e. Rêzkirina hevokên qanûnê, egerên amadekirina xalên qanûna bingehîn ji bona avakirina dewletê, dezgehên dewletê pêşeroja dewletê gelek û gelek girîng in. Lê gava meriv rewşa kurdan dide berçavan ev girîngbûnîya hanê taybetîyek gelek mezin digire. Ji ber vê jî; ji bona me kurdan hestên amadekirina Qanûna bingehîn tevî yeke yekxalên wê gelek girîng in. Tevî vê jî hest, eger û rêzkirina her hevokên girîngîyek mezin dibînin. Ji ber rewşa



netewî ya kurd ev girîngî çîyek bê hempa digire. Ji ber vê jî kurdbûnîya Serokê Komîta Amadekirina Qanûna Bingehîn gelek û gelek girîng e.

Buyera sisêyan jî ew e ku Kurdek, li ser navê kurdan bû Serokê Konseya Iraqê. Her çend bijartina Serokatîyê bi dorê û demî be jî, Serokê Konseyê Kurdek li ser navê Kurdan bê destnîşankirin buyerek gelek mezin e û hestek pir û pir bi me kurdan re pêk tîne. Di vê demê de destnîşankirina Mîrze Mam Celal Telebanî, ji bona Serokatîya Konseyê, kiryarek gelek mezin e.

Wek her neteweyî bêguman di nav me kurdan de jî dubendîtî û lînêrînên gelek cuda hene, ji xwe ne pêwîst e ku em hemî ji kesekî, yan jî ji partîyekî hez bikin. Yê me jî wek her neteweyê lînêrînên me yên siyasî, hest û helwestên me yên cuda hene, ne tenê hene gerek hebin jî. Em her yek di nav partî û rêxistinên cuda de ne, yan jî ji partî û rêxistinên cuda hez dikin. Dibe ku em qet ji partî û rêxistinêk jî hez nekin. Ev tişt gelek xwezayî ye û pêwîst e heta sînorek weha be jî. Lê

li ber berjewendî û destketinên netewî, pêwîst e ku hest û helwestên me yek bin, yan jî gelek nêzîkê hev bin.

Li gor min kesayetîya van her sêyan çî dibe bira bibe, kî ji kesayetîya wan, yan jî ji lînêrînên wan û partîyên wan hez bike yan jî neke encam qet û qet nayê guhertin. Ew li ser navên me kurdan li wê derê ne û ew di karên xwe de rûmetê hestên me ne. Her helwestek wan erênî yan jî neyênî me girê dide û bandorên mezin jî li ser pêşeroja me nîşan dide. Ji ber wê jî em her kurdek li her deverê piştgirên wan û xebata wan in. Pêwîst e ku em li her deverê wan biparêzin li wan xwedî derkevin. Ji ber ku ew niha rûmeta me ne.

Rewşa wan xweşî û geşîyek dixê ser hestên me. Pêwîste ku em her kurdek bi wan bipesinin, li şûna xwe û li gor karîniya xwe li pişt wan bin.

Pîroz be karên wan!

Her di karên xwede serketîbin.



DIDERBARÊ XEBATA KOÇ-KAK'DE AGAHDARÎ

Xalit

Bi armanca pêşdexistina kar û xebata komela Koç-Kak'ê, di warê tevger, rêxistin û rêvebirina xebat û çalakîyan, ji bo perwerdekirin û hînkerîya endaman, komela Koç-Kak'ê bi hevkarîya sazîya Odyssee, xebata xwe ya bi awayê qurs û semîneran ku dimeşand, bi mijara Şideta Nav Malê û awayê kar û xebat û amadekirina projeyên di vê derbarê de, di nava rojên 28. 11. '03 û 30. 11. '03 de berdewam kir.

Li gor daxwiyaniya mamoste, baştir hat gehîştin ku ne tenê di nav malên biyaniyan, lê di nav malên Hollandîyan jî têra xwe tadeyî û lêdan heye. Li gorî îstatîstîkan, ji alî mêran ve li 3 mîlyon jin hatine dan. Lê di nav malên biyaniyan de tadeyî bêtir e. Hat gotin ku li Hollanda jinên Tirk, Kurd û Marokanan bêtir ji alî mêran ve tîn kuştin. Ku ne tenê li jinan, her weha li zarokan û bi taybetî li keçan jî tadeyî tê kirin û tîn lêdan. Mamoste behsa raporên Rîyaxê yê di derbarê tadeyî û çavsorîya li jinan tê kirin ku gelek wek sir veşartî dimînin. Hat gotin, ku wek komelak Kurd ya xwedî berpirsiyar, di vî warî de dikare çi bike?

Temamê endam û rêvebirên komelê yên ku beşderî vê projeyê bûbûn, bi gelemperî û bi awayekî aktîf beşderî daxwiyani û gengeşîyan bûn. Li gorî mijarê, di derbarê civatên dervî Kurdan û bi taybetî civata Kurd ya li Kurdistanê, ya li Ewropa û ya li Hollanda lênerîn û ramanên xwe bi lêv kirin.

Temamê endaman hemfikir bûn ku di hemû civakan de di nav malê de heta redevyekê çavsorî û tadeyî heye; lê di civakên Rojhelat û di civaka Kurd de bêtir e. Li gorî hinekên, mafê tu kesî tune ye ku bê eger tadeyê li kesî bike an bikuje; lê li gorî hinekên jî, çi eger dibe bila bibe, mafê mirovekî nîn e ku çavsorî û tadeyîyê li mirovekî bike an bikuje. Loma di vî warî de herkesî bi serbestî û bi awakî demokratîk lênerînan xwe gotin û parastin.

Ji alî beşdarvanan ve gelek egerên çavsorî û tadeyîyê hatin rêdan: aborîyek xerab û bi şûndemayî, yanî aborî û çanda pedersahî û feodalîzmê; baweriyên dînî yên li ser aborî, huqûq û çanda serdema navîn ava bûye; newekhevîya qanûnî ya hinek dewletan; fîzîken xwirtbûna mêran; neperwerdekirin, bêxwendin û nezaniya civak û mirovan wek egerên zor û tadeyîyê hatin rêdan. Li ser van mijaran ramanên cuda derketin holê û di nav beşdarvanan de gengeşiyên balkêş û bi fêde hatin kirin.

Di vê civînê de bêtir hat têgehîştin ku di nava beşdarvanan de kêmanîya peywendî, li hev gohdarîkirin, di hev gehîştin û bi hev re bi aheng karkirin hey e. Lê tîştê balkêş û cîhê şanazîyê ew bû ku him di vî civînê û him jî di civînan berî vêya de, ciwanên me, bi awakî aktîf beşdarî civînan bûn; balkêşî rêdan û gohdarî kirin, bi serbestî ramanên xwe bi lêv kirin û di çalakî û pêşandanan de cîhê xwe girtin. Loma di wan jî bo rêvebirin û rêxistina komelê, kar û xebatên civakî yên pêşerojê ku rolekî sereke û grîng bilîzin, bêtir hevî dan beşdarvanan.

Li gorî daxwiyaniyan tamamê beşdarvanan, ji van civînan gelek fêde hat dîtin. Di derbarê kar û xebat û rêvebirina komelê û di hundir ahengekê de bi hev re karkirin, ne perwerdebûna endaman hertim bûye egerê gelek kêmanîyan. Ev civîn, bûn egera ku berpirsiyarîya girtina însiyatîfê bi her endamî re wekhev bide gêkirin.



Li gorî mamoste, pir girîng bû ku bi komelak Kurd re projeyek werê hat çêkirin: Mamoste got ku; "Ez pir kêfxweşim ku min ev komele ji nêzîk de nas kir. Ez bala xwe didimê ku ev komele ne tenê bi pîrsgirêkên Kurdan, herwekî bi pîrsgirêkên hemû civakan ve têkel dibin û ji bo

çareserîyan hewl didin. Ya din, ez dibînim ku ev komele xwedîyê kadroyên pêşverû, demokratîk û gelek fereh diramin; ji bo çareserîya gelek pîrsgirêkan ev jî potansîyelek grîng e. Ez'êji niha û pê de jî bixwazim bi kêfxweşî bi vê komelê re kar bikim."

www.arsivakurdi.org



BINGEHA ŞIDETTA NAV MALE YA DÎROKÎ

X. Ûso

Em dikarin wek tadeyîya nav malê jî bi nav bikin. Gava ku em bi zanîyarî vê pirsgirêkê vejenînin, divê em dakevin bingeh û jêdera şidetê: em dinêrin ku şidet, di nava rawiran de jî wek daxwaz an lebatek êrîşkarî hey e. Di nava rawiran de ev, pîranî bi armanca têkefîyên cinsî û xwarinê xwe rêdide.

Bi giranî jî yên xwirt êrîşî yên qels dikin. Ji bo hemû jîndaran du armancên bingehîn yê jiyawî hene; ya pêşî, jîyana xwe berdewamkirin, yanî bidestxistina xwarin û vexwarinê, ya din jî, berdewamkirina dola xwe, yanî pêwendîya cinsî, zayin û xwedîkirina kerî ye. Lê di nava mirovan de şidet û êrîşkarî berferehtir, sistematîk, bi rêk û pêk bidîh bûye û hatiye meşandin. Bi armancên xwarinê û bi baweriyên mistîkî, heta demekê hinek qebîleyên li parzemîna Afrîqa bi navê Yamyam'tiyê mirov dikuştin û wan dixwarin. Lê şideta nav mirovan ya herî dijwar, bi şerê nav civatan, serwerîya çînan û bi mulkîyeta kesayetî re jî di nav malê de xwe rêdide.

Li gorî lêkolînên dîrokî û atropolojîk, ji bo wargehên seydê, pêşî di nav qebîle û eşîretan de şer û kuştin dest pê dike. Piştî qebîleyên bi egerekê birçî dimînin ku xwe davêjin nava civatekê ku wek kole tên pejirandin, li ser wan zordarî û tadeyî tê kirin. Hinek qebîle jî, ji ber egerên birçîbûnê êrîşî civatên din dikin û dest datînin ser xwarina wan; endamên civata têkçûyî ya dikujin, yan jî wan dîl digirin û dikin kole. Di nava van tevgerên civakî yên dîrokî de, mulkîyeta kesayetî, mulkîyeta mêrdertê pêş û zagonên li gorî vê mulkîyetê dertên holê.

Ji bo parastina mulkîyetê an parastina ji hêzek din, ordî û dewlet saz dibin. Kî serwerê aborîyê be, ew xwedîyê dewlet û hemû sazîyên wê ne jî. Hemû zagon li gorî fêda wî û mulkîyeta wî çêdibin. Her olek li gora menfîetên mulkîyeta kesayetî jî nû de têsêrastkirin û dibe ola dewletê ya fermî. Mafê jinê û zarokan binpêdibe û dibin perçakî mulkîyeta mêr.

Di seranserê dîroka mirovahîyê de, hêzên mêtinkar li civata mêtîngeh, efendî li koleyan, axa li gundiyan, maldar li karkeran mêr li jin û zarokan, mêrên xwirt li yên qels, dê li zarokan, xweh û birayên mezin li yên biçûk bi awakî tadeyî kiriye. Hemû dînen ku bi çînan ve girêdayî û di serdema navîn de derketîne holê, em dinerîn ku wek îdeolojîya wan çînan derdikeve holê û berjewendîyên wan diparêzin, zor û şideta wan rewa rêdide.

Di nav mala Kurd de şidet

Li Kurdistanê hem ji dervî malê û hem jî di nav malê de bi berferehî şidet hey e. Şidet, demek pir dirêj e ku ji alî dewletên serdest wek pergalekî terbiyekirin an perwerdekirinê bi kar hatiye. Zarokên Kurd li dibistanan û xortên Kurd li leşkerîyê bi gelemperî ji alî dewletên mêtinkar ve di bin tadeyî, gef û lêdanê de dijîn.

Di civata Kurd de çî pirsgirêkê çê bibe, bi pîranî bi hêza xwe ya şidetê dixwazin safî bikin. Lewra bi qanûn û otorîta mêtinkaran bawerîya wan nîn e. Ji bo çareserîya pirsgirêkê xwe, gava ku serî li meqamên dewleta mêtinkar didin jî, tên binçavkirin û li wan tif, heqaret û lêdan tên kirin; ji wan rişwetek giran tê xwestin.



Di civatê de axa, beg, şêx û maldar tadeyîyê li mirovên xizan û reben dikin. Birayê xurt, dikare tadê li yê qels bike. Bav yan mêr jî dikare tadeyî li temamê mala xwe bike. Hem otorîta mêtinkar, hem ya dîni û hem jî otorîteyên civatê ya feodalî vî mafî dide bav(mêr). Jin û zarok divê bi her awayî di bin fermana bav(mêr) tevbigerin. Di nav malê de mafê mêr heye ku şaşîyan bike, lê mafê jin û zarokan nîne ku şaşîyan bike, ew dikarin ji bo şaşîyên xwe bête cezakirin. Kengî ji dervî ferman û daxwaza sermîyanê malê derkevin, di hinek rewşan de lêdanê û di hinek rewşan de jî kuştinê heq dikin.

Li kurdistanê, keçek an jinek bi mêrekî re bireve an rakeve li gorî lênerîna civakê kuştinê heq dike. Bav kê bixwaze, divê keç bi wî re bizewice. Hinek bav, keçên xwe, beramberî peran difroşin mirovên 60-70 salî; gava ew jina ciwan ji cem wî kalî bireve û bera du yekî de jî, tê pejirandin ku hem namûsa mêr û hem jî ya bavê bînpê dike; wê gavê ew jin û kesê wê revandîye "kuştinê heq dike".

Li gorî mafê olî û yê feodalîyê, mêr dikare du an çar jinan jî bîne: ev jî gelek caran egerê pevçûn û şideta nav malê ye. Kengî mêr bixwaze dikare bi jinê re rakeve, lê ew mafê jinê nîne. Mêr ji tiştê hêrs bibe dikare ji jin an zarokan re bixeyide û xeberan bide, lê mafê jinê nîne bersîvê bidê.

Egerê şideta nav malê ya li Ewropa

Malbatên di hundir vê rewşê de tîn Ewropa, çand, bawerî û normên xwe yê civatî jî bi xwe re tînin. Lê li Ewropa jîyana civatî, aborî, çandî û perwerdeyî bi gelekî cudatir e ji ya welatên rojhelat, yê ku hîna çanda feodalî û olî lê serwer e. Li van welatan di warê aborî, sîyaset, huqûq û çandê de demokrasîya kapîtalîst ya lîberal serwer bûye. Di van waran de, çand û huqûqê feodalî û dîni hema hema bi temamî bandûra xwe wenda kirîye. Li gorî zagonan û bi awakî "relatîf" mafê jin, zarok û kal û pîran wek yê mêran û maladaran tê parastin û di bin stara qanûn û dewletê de ye.

Mafê kê bêt xwarin an tade lê bêt, ew dikane serî li meqamên dewletê bide û mafê xwe biparêze. Li vir firseta jinekê jî hey e ku bibe xwedîyê malekê an karekî. Li vir her zarok, çi keç çi kur, pêwîst e ku biçe dibistana bingehîn û firseta her zarokî hey e ku bibe xwedîyê meslekekî. Kes û malên biyanî ku li vir mafê rûniştinê distînin, di

bin xwedîyê mafê civaka xwedî jî. Loma jin û zarok êdî ne di bin mulkîyeta mêr de ne. Lê mêr bi piranî, di otorîte û mafê ku civaka ku jê hatiye dayîyê de israr dike. Ev jî dibe egerê pîrsgirêk, şidet û nakokîyên nav malê.

Bi gelemperî jin û keç nikarin li gor daxwaza xwe karekî bikin, li gor kêfa xwe cila li xwekin an bigerin. Keç, ji dibistana bingehîn zêdetir, encax li gor daxwaza bav û dê dikare bixwîne an nexwîne. Mafê keçan, û li gor hinek malbat yê kuran jî, nîne ku wek ciwanekî Ewropî hevaltîya hemcinsê xwe bikin, hela ew ji dînekî din be, ev qebhetek mestire.

Yên ji dervî van binyatan derkevin, dikarin beramberî tadeyî an şidetê werin. Bi gelemperî li Ewropa jî aborîya malê di destê mêr de ye. Piranî mêr dest datîne ser mehanîyên jin û zarokên xwe û bi kêfa xwe xerc dike. Hinek mêr(bav), perê jin û zarokên xwe li qumar, alkol an li cihê kêfê xerc dike û wan birçî û bêmesref dihêle: gava jin û zarok doza peran dikin jî, xeberan ji wan re dide û li wan dixê. Hinek ji bo xerckirinê qet peran nadin zarokên xwe, ev jî gelek caran dibe egerê xerabûna kesaytîya zarokan û pîrsgirêkên psîkolojîk. Loma gelek zarokên di van rewşan de, ne ji xwe re û ne ji ji dê û bavê wan re tu rûmeta wan namîne, virotin û bikaranîna madeyên tevzandinê, dizî û serserîti dibe perçakî jîyana wan. Ji ber van egeran em dizanin gelek zarok û xort di navendê rehabilitasyonan û di girtûgehan de ne.

Hinek keç û kur dixwazin gelek pîrsgirêkên xwe bi dê û bavên xwe re par bikin, lê gava dê û bav li wan guhdarî nekin an bi şidetê bersîv bidin wan, ew jî bi hizira ku dê û bavê wan nezan, ehmaq an paşverû ne; loma derdên xwe davêjin nava xwe û daxwazên xwe bi dizî pêk tinîn, kiryar û peywendîyên xwe ji dê û bav û nasên xwe vedîşêrin; yanî ew zorgayî kirina derew û durûtîyê tîn hîştin. Heta ku hinek keç û xort ji malbata xwe veşartî xwe davêjin bazara canfirotinê. Werê ku endamê civata ku derûdora wan jî, ya divên çî ji me re, yan jî çav û dev û guhên xwe digirin.

Jin bi mêrê xwe re li hev neke, û bixwaze mêrê wê wê berde, lê mêrê wê bernede biçe bi mêrekî din re bijî, an zewicandî be, bi mêrekî din re rabe û rûnê, ev dikane bibe egerê kuştina wê. Piranî bav û dê kê bixwaze, divê keça wan bi wî re bizewice. Bi piranî bav û dê, ji keç an ji kurê xwe



re, ji welat keç an kurê merivekî xwe tînin. Kur, ji dervî îrada dê û bavê xwe derkeve û bi yek musilman an ne musilman re bizewice, heta redayekê dikane bê pejirandin û dikane ji malê bê îzolekirin. Lê keç vî tiştî bike, ya bi temamî tê îzolekirin û carna jî tê kuştin.

Ya herî balkêş jî, bi guhertina aborîya feodalî û geşbûna çanda kapîtalîzmê, weşan û komunîkasyona lîberalîzmê, li civata Kurd ya li Kurdistanê hetanî çavîya wan ya bi çûk jî bandûrê dike û wan peyderpey diguherîne, lê

mirovên me yên hatine Ewropa, ji wan jî bi paşdetir dimînin. Gava ku ji welat hatin, rewşa welat çibû, dixwazin wê rewşê biparêzin. Egerê vêna jî nezanîn û teng ramandina mirov e. Dê û bav çiqas neyên guhertin, her çiqas zor û şidet li wan bêt jî zarok, bi piranî tî guhertin û wek xwe dikin. Ger em di vî warî de karibin çiqas bername û civînan çêbikin, afîşên balkêş dardakin û bi rêya nivîsan propaganda bikin, ji bo perwerdeya dê û bavan wê rolekê bilîze.


www.arsivakurdi.org



Beste lezers,

Bijna iedere tijdschrift heeft tegenwoordig wel een eigen website op het internet. Om de continuïteit van onze tijdschrift te waarborgen, moet ook Kurdnasin met ontwikkelingen van onze huidige tijd mee.

Met grote vreugde willen wij dan ook onze lezers mededelen, dat Kurdnasin sinds kort nu haar diensten online op het internet aanbiedt. Om een grotere doelgroep te groep te bereiken zijn we een samenwerkingsverband met Koc-Kak aangegaan, dat ons vanaf heden de mogelijkheid geeft om onze tijdschrift maandelijks op de website (www.nistiman.com) te publiceren.



Nistiman.com is een website dat een aantal jaren geleden in opdracht van Koc-Kak, door en voor jongeren is ontwikkeld. Nistiman.com heeft als doelstelling om op een sociaal en verantwoord manier jongeren te informeren van de actuele problematiek waarmee veel Koerdische jongeren die tussen twee culturen op groeien te kampen hebben. Sinds haar oprichting heeft de site een veel bredere doelstelling gekregen en is in laatste twee jaar tot een groot informatie portal voor zowel jong en als oud uitgegroeid.

Met het integreren van "Kurdnasin Online" in Nistiman.com, zijn we van mening dat we een zeer postieve bijdrage aan de Koerdische gemeenschap in Nederland kunnen leveren en op deze manier veel beter aan de eisen en wensen van onze lezers kunnen voldoen.

Kurdnasin zal een aantal gloednieuwe diensten introduceren, zo zal het bijvoorbeeld in de toekomst mogelijk zijn om gratis een online abonnement aan te vragen, interactief over actuele onderwerpen te kunnen discussieren en artikelen van lezers zelf op het internet te publiceren.

We hopen u hiermee voldoende geïnformeerd te hebben.

Met vriendelijke groet,

De redactie van Kurdnasin



BEJI, BIJ TIKRIT

Ferry Biedermann (de Volkskrant)

De ontdekking van een videoband van de Iraakse geheime dienst leidt tot een speurtocht in Irak naar een fles met gas dat kan worden gebruikt voor de productie van chemische wapens. Werd er zeep gemaakt of zenuwgas?

De Arabische Schoonmaakmaatschappij Aradet in Beji ligt aan de rand van een van de grootste raffinaderijen van Irak, die grote zwarte rookwolken uitspuwt. Aradet maakt zeep en gebruikt daarbij een stof die ook kan worden gebruikt bij de productie van het zenuwgas Sarin. Het terrein ligt vol met lege gasflessen. Eén specifieke fles, mogelijk ook aanwezig op het terrein, zou vanwege de herkomst iets kunnen verhelderen over de vraag of Irak in de jaren negentig en daarna nog een geheim programma had voor de productie van Sarin.

De speurtocht naar die ene gasfles begon een paar weken geleden, toen een collega en reisgezel van een Amerikaanse krant opmerkte dat een contact van hem in Bagdad een videoband had van de Iraakse geheime dienst waarop chemische wapens worden genoemd.

Uit de band blijkt dat de Iraakse regering in de zomer van 2000 een fles in handen kreeg met gas dat oorspronkelijk in de jaren tachtig bedoeld was voor de productie van zenuwgas. De fles was jarenlang verloren en de wijze waarop de regering er in 2000 mee omsprong, kan inzicht geven in de vraag of er toentertijd nog altijd een programma bestond voor de productie van zenuwgas.

Na wekenlang onderzoek dringt zich, ondanks die opmerkelijke vondst, één conclusie op: het blijft bijna onmogelijk over het Iraakse wapenprogramma duidelijke conclusies te trekken. Niettemin zei de controversiële voormalige VN-wapeninspecteur Scott Ritter, na alle details over de zaak te hebben gehoord: 'Dit is een van de hardste stukken bewijs tot nu toe dat Irak geen geheim wapenprogramma had.' Ook de wapeninspecteurs van het huidige Unmovic-team noemen sommige aspecten die erop duiden dat Irak VN-regels volgde, 'verrassend'.



Na de videoband, waarop de hoogste baas van de geheime dienst van Saddam Hussein staat, uitputtend te hebben bestudeerd en een aantal betrokkenen te hebben gesproken, is de volgende reconstructie te maken.

In de zomer van 2000 biedt een groep mannen op de zwarte markt van Bagdad een gasfles met inhoud te koop aan. De fles zou of een zenuwgas bevatten of een bestanddeel daarvan. De stof is afkomstig uit het complex Al Muthanna bij Bagdad, waar Irak vóór 1991 chemische wapens maakte.



Ongelukkigerwijs voor hen, komen ze terecht bij een informant van de geheime dienst, de Mukhabarat. De informant lokt ze in een val, de gasfles komt weer in handen van de regering en de handelaren worden gearresteerd.



Het voorgaande roept al genoeg interessante vragen op. Uit gesprekken met een van de handelaren die betrokken waren bij de verkoop, blijkt dat de fles in 2000 al vier jaar in een achtertuin had gelegen in de arme shi'itische volkswijk Saddam City. Het is niet helemaal duidelijk wanneer de stof illegaal uit Al Muthanna is gekomen en hoe.

Het meest waarschijnlijk is dat de fles gestolen is door medewerkers van de fabriek en naar buiten is gesmokkeld.

Al Muthanna is een groot complex buiten Bagdad waarvan bekend was dat er voor 1991 chemische wapens werden vervaardigd. De laboratoria en fabrieken werden in 1991 tijdens de Golfoorlog door de Amerikanen gebombardeerd en de VN-wapeninspecteurs hebben het karwei begin jaren negentig afgemaakt. Ze hebben er zowel apparatuur als grondstoffen vernietigd.

Als de ene fles in 1996, zoals wordt gesuggereerd, uit Al Muthanna is gekomen, dan zijn de inspecteurs niet zeer grondig te werk gegaan. Een voormalige Unscop-inspecteur geeft toe: 'Gezien de enorme omvang van het complex en de toestand waarin het verkeerde, is het niet onmogelijk dat we dingen hebben gemist.' Het is goed mogelijk, blijkt uit gesprekken met betrokkenen, dat de fles op het terrein begraven lag of dat het regime veel materiaal al snel buiten het complex had opgeslagen.

Wat er met de fles is gebeurd nadat die in 2000 weer in handen was gekomen van de regering is echter veel interessanter. Daaruit kan immers blijken of Irak het spul nog nodig had voor een wapenprogramma.

Op de videoband staan Tahir Jalil Habbush, de machtige baas van Iraks gevreesde geheime dienst, de Mukhabarat, de informant, Saleh Abed Nasser, en Abdel Wahab, het hoofd van de wetenschappelijke afdeling van de militaire inlichtingendienst, de Istikhbarat. Ze zitten in het kantoor van Habbush en de opname lijkt routine, net zoals sommige mensen van belangrijke besprekingen een geluidsopname maken.

Het grootste deel van het gesprek gaat over een complicatie met de informant. Hij wordt bedreigd door de familie van een van de gearresteerde handelaren, die hebben ontdekt dat hij achter de val zat. De gearresteerde handelaar is ook nog eens familie van zijn vrouw. Het hoofd van de Mukhabarat is er bij omdat de hele operatie om uit te vinden hoe de fles op de zwarte markt terecht kwam, nu in gevaar is.

Plots vraagt Habbush aan Abdel Wahab wat er bekend is over de stof en wat ermee gedaan wordt. Abdel Wahab antwoordt dat er een test is gedaan om het spul te identificeren. 'Mijnheer, de stof is afkomstig uit Al Muthanna, waar chemische wapens werden gemaakt.



Voor een verdere test moeten we ergens anders naartoe. De Arabische Schoonmaakmaatschappij kan het gebruiken. We geven het aan ons Nationale Monitoring Directoraat om schade aan ons land te voorkomen en zodat de naam van onze organisatie er niet bij betrokken wordt.'

Het Nationaal Monitoring Directoraat (NMD) was de organisatie van het Iraakse regime die de contacten moest verzorgen met de VN-inspecteurs en die in de praktijk vaak werd gebruikt om hun werk te hinderen en om hen te bespioneren.

Het was ook de organisatie die aan de Verenigde Naties kon vragen om materiaal, voorheen bedoeld voor chemische wapens, te gebruiken voor civiele doeleinden. Dat was volgens Ritter en andere inspecteurs vaker gebeurd en er was meer materiaal naar de Arabische Schoonmaakmaatschappij gebracht voor vreedzaam gebruik.

Op de band wordt gesproken over de stof alsof het gaat om een ingrediënt van het zenuwgas VX. Uit onderzoek blijkt echter dat de fles de niet zo 'sexy' stof HF, Hydrogen Fluoride, oftewel waterstoffluoride bevat. HF is een stof die in de civiele industrie gebruikt wordt bij de productie van zeep, maar ook als katalysator dient in de productie van het zenuwgas Sarin en tevens wordt gebruikt bij de productie van verrijkt uranium voor kernwapens.

Als de stof aan het NMD is overhandigd, kan dat volgens Ritter en de huidige Unmovic-inspecteurs betekenen dat de Irakezen de regels wilden Irak volgen, zelfs in 2000, toen de Unscow-wapeninspecteurs a twee jaar niet in waren en hun opvolgers van Unmovic nog lang niet in het land waren. 'Dat ze de NMD inschakelen wil zeggen dat het legitiem is', zegt Ritter. Unmovic vindt het 'verrassend dat ze dit deden zonder de aanwezigheid van Unscow'. De route zou via het NMD naar vreedzaam gebruik in Beji zijn.

Als Irak nog een Sarin-programma had, dan zou de stof daarin gebruikt kunnen worden en zou het 'zonde' zijn om er zeep van te maken. Daar staat tegenover dat de inhoud van de fles - 688 kilo, blijkt later - miniem is en dat een geheim programma wellicht in gevaar gebracht zou zijn door een fles van buitenaf te gebruiken.

